

Ji bo dêûbavên zarokên wan diçin kreşên Berlinê

14.12.2020

Agahiyên girîng ji bo dêûbavan li ser xebata kreşên li welatê Berlinê ya piştî 16.12.2020an

Stî û mîrzayên rêzdar, dêûbavên hêja,

ji ber bûyerên enfeksiyonê yê bi berdewamî zêde dibin şansolye û serokên hikûmetan û her wisa Senatoya Berlinê di 13.12.2020an de li ser tedbîrên berfireh yê kêmkirina pêwendiyên li hev kir. Divê bi vî awayî hejmara enfeksiyonên nû dakeve û pêşî lê were girtin, ku pergala tenduristiyê di bin bareke mezin de nemîne.

Ji bo pêkanîna vê armancê divê hejmara pêwendiyên li hêlînên zarokan ji 16.12.2020an û vir ve hete 10.01.2021an gelek were kêmkirin.

Ji ber vê yekê em bi lezûbez ji we dixwazin, ku hûn zarokên xwe di vê qonaxê de bi qasî ku ji destê we tê, li malê bihêlin, ango hete pêdiviyê awarte û acîl ya ji bo lênêrîna zarokên we çênebe, hûn vê xizmetê bi kar neynin. Ev yek ji bo kêmkirina pandemiyê kedeke mezin e.

Gava li navendên we ji berê ve biryara li ser girtina hêlînan ya di dema betlaneyê de hatibe standin, ev biryar di vê rewşê de jî wekî xwe dimîne.

Li gorî vê yekê, em ji we rica dikin, gava pêdiviyê awarte û acîl ya ji bo lênêrîna zarokên we çêbû, hûn bi navenda xwe re yekser li ser vê mijarê biaxivin û bi riya pêwendiyê rasterast bi hev re li riyekê çareseriyê bigerin, ku armanca kêmkirina pêwendiyên li ber çavan digire. Di vê çarçoweyê de, hûn dikarin bi taybet wisa li hev bikin, ku ji 16.12.2020an heta 08.01.2021an li gorî pêdiviya lênêrîna tenê ji bo rojên diyarkirî yan jî tenê ji bo demên pêwîst yê lênêrîna, hûn sûdê ji xizmeta lênêrîna bigirin.

Bi riya vê hewldana hevpar ya fîzîkî em van şertan bi cî tînin, ku piştî derbasbûna lockdownê ji bo tevahiya zarokan teqez xizmeteke ewle dîsa were pêşkêşkirin.

Di derbarê pêşketin û lihevkerinên di demên pêş de em ê yekser agahî bidin we.

Li gel silavên germ,
Peywirdar

Holger Schulze